

# **Ev Kitaba mewlîda şerîf**

**bi zimanê Kurmancî û zerîf Esera**

**Şêx Elî Umer Minle Elî**

Bilbil 1367 salên Hicretê/1947 Z.

Qîmeta her nîsxekê 150 quruş Sûrî ye

Çapxana Araks - Heleb (Sûrye) - cada Tilel



**Rastanîna Zimanî**

**û**

**Veguhastin ji Tîpên Osmanî**

**Dr. Mihemed Ebdo Elî**

**Efrîn . 2014**

**Ev Kitaba Mewlîda Şerîf**

**Bi Zimanê Kurmancî û Zerîf**

**Esera**

**Şêx Elî Umer Minle Elî**

**\*\*\*\*\***

**Bilbil 1367 salên Hicretê/1947 Z.**

**Qîmeta her nisxekê 150 quruş Sûrî ye**

**Çapxana Araks - Heleb (Sûrye) - cada Tilel.**



**Rastanîna Zimanî**

**û**

**Veguhastin ji Tîpên Osmanî**

**Dr. Mihemed Ebdö Elî**

**Eferîn... 2014**



## Jînenîgariya Şêx Elî

Elî Umer Minle Elî ku bi Şêx Elî dihat nasî, li sala 1912an li gundê Dodo-Meydana ku bi ser devera Bilibilê ve ye jidayîk bûye. Ew bi navê kalikê xwe Minle Elî, ku zanayekî olî bû bi nav bûye. Şêx Elî di çûkaniya xwe de li ser destê Hec Îbrahîm (bavê Smaîl) perwerdeya olî wergirtiye û fêre zimanê Erebî û tirkî jî bûye, Hec Îbrahîm (bavê



Smaîl) li wê demê zanayekî olî bû û li gundê Hec Xelîl rûdinişt. Loma jî bandora mamosteyê wî pir lê bû bû, û gava ku Hec Îbrahîm çû ser qedera xwe, Hec Elî bi risteke ji 150 malikî şîna wî gerand, û belkî di her sirûdeke vê pirtûkê de navê wî bibîr tîne.

Li salên sî ji sedsala bîstan, piştî derketina tevgera Mirûdan, malbata Şêx Elî barkir û çû li gundê Bêkê bi cih bû, ew gund wê hîngê li devera Bilibilê gundê serke bû ji gundên malbata Şêx Smaîl Zade re.

Piştî wê, Şêx Elî bûpêşîmamê mizgefta Bilibil û zarokên gund jî fêr dikirin, û li sala 1945an bû karmendê nifûsê li devera Bilibilê. Lê wî li wê salê dev ji

wî karî berda, hat li bajarê Efrînê rûnişt û nivîsgehek ji bo rêvebirina karûbarên xelkê li ba dezgehên dewletê kir.

Li sala 1959an li gel hinek navnasên navça Efrînê, ji wan: Hec Bîlal Zîbar, Xoce Resûl silêman...), komeleya (Îslamî ya rindî û çêxwaziyê) li navça Çiyayê Kurmênc vekir. Komeleyê karûbarên çêxwaziyê dikir, mizgeft û dibistan li navçê ava dikirin û arikariya (mala sêwiyên Efrînê û Ezazê) dikirin. Ew komela ra salên şestî ji sedsala borî dixebitî, pişt re ew bi biryareke asayîşî ji hêla wezaretê karûbarên civakî de li Sûriyê hate qedexekiri û girtin.

Şêx Elî mirovekî oldar û çavekirî bû, ji xwendin û ji helbestê jî hez dikir. Gelek ristên wî di warên pesindana pêxember, evîndariya sofftiyê û di warê niştimanî û netewî de jî hene.

Şêx Elî li sala 1975an di bûyereke hatûçûyê de li ser riya Heleb û Efrînê jiyana xwe ji dest da.

Ristepirtûka wî ya olî ya bi navê (ev kîtaba mewlîda şerîf bi zimanê kurmancî û zrîf) li sala 1367an.G/1947an.Z li Helebê li çapxana Araks bi zimanê Kurmancî û tîpên Erebî-Osmanî hat çapkirin, lê belê, wekî ku di sirûda destpêkê de hatiye, wî ev nivîsar li sala 1363g/1944Z de nivîsandiye. Û ji ber ku karên nivîskî bi zimanê Kurdî li wan deman, nemaze di

warê olî de, pir hindik bûn, me xwast em wî karî windabûnê biparêzin û wî veguhêzin tîpên Kurdî yê Latîni û ji xwendevanan re wek wêjeya olî ya kurdî pêşkêş bikin. Lê pêwîst e em bêjin, ji ber ku li wan deman rêzman û rênvîsa Kurdî baş ne hati bû nas kirin û cihê xwe jî di nivîsandinê de negirti bû, loma jî dilovanî Hec Elî mewlîda xwe bi zimanê devkî yê wê demê nivîsandi bû. Loma jî me di amadekirina nivîsa Kurdî ya Latîni de, qaserî ku gengaz bû, şaşîtiyên rêzmanê û rênvîsê, me serast kirin.

Ji bilî wê, şorên ku bi Erebi yan Tirkî tê de hati bûn û ciyokên wan bi Kurmancî hebûn, û terezûya ristê ne dixistin, me pê guhertin, lê ew jî ne gelek bûn. Hêvîdar in em tê şaş ne çûbin û serkeftî bû bin.

Dr. Mihemed Ebdo Elî

Efrîn... 15.5.2014.

## **Xwendevanên Kurmancan ên delal:**

***Min ji we re mewlûda şerîf bi zimanê Kurmancî û zerîf, ji xwendevanên Kurmancan re nivîsand, hêvî dikim birayên min ên dîndar bi xwendina vê mewlûdê dilşad bibin.***

***Ji vê û şûn de, ezê dîwana Minle Elî bi zimanê Kurmancî û zerîf ji xwendevanên delal re diyarî bişînim.***

***Dîwan ji munacat û pesna fexrê kâinat wekî gulistanan hatiye xemlandin.***

***Minle Elî***







## E'ûzû bîllahî mine Şeytanî recîm Bismî Ellahî El Rehmanî El Rehîm

Bi 'ewna Xwdê min ev mewlîda wî fexrê cîhanî  
Nivîsand bi qelemê xwe bi zimanê Kurdanî  
Hêvî dikim hemû birayên min dilşad bin herdem  
Lava bikin li min xudanê cirm û sûc û 'isyanî  
Di sala hezar û sê sed û şêst û sê salên Hicrî de  
Min şand ev yadîgara mewlîda ew şemsê tabanî  
Ji birayê xwe Samîl re bi tewfîqa cenabê heq  
Ji gundê Hec xelîl ew li nav Eşîra Şêxanî  
Rica dikim ji ixwana wê senekin 'uzir û kêmanî  
'Aciz im ez jî nadana nizanim 'ilm û 'urfanî  
Jar e pir Bavê Sma'îl li dergehê bûye saîl  
Li bihuştê bike naîl wî bibore tu bi xufranî  
Li mehşerê tu ey Xweda ji Mistefa meke cuda  
Min qûlê 'aciş û geda xudanê lutf û îhsanî  
Selat û slama li ser wî qurre<sup>1</sup> çavan  
Heya roj tim derê ava bi qasî dilopên baranê



---

<sup>1</sup> . Bi Erebî – قرّة العين

**Qesîda mewlîda şerîf  
bi zimanê Kurmancî û zerîf**

Werin kî dike bi xwendin bide  
dîsa hat meha mewlîdê  
Kî dixwaze rehma xwedê  
dîsa hat meha mewlîdê  
Qedra mewlîdê bilind e  
kî bike dostê Xwedê ye  
Mihemed şefî'ê wî ye  
dîsa hat meha mewlîdê  
Kî ji pêxember hez dike  
wê mewlîda wî bike  
wê li wî şefa'etê bike  
dîsa hat meha mewlîdê  
Xudanê tac û zemzemê  
xudanê qedra mu'ezzemê  
Taha bû şeva Duşemê  
dîsa hat meha mewlîdê  
Hîngî heye bi dest te de  
xwendin bide tu mewlîdê  
Fexrê cîhanê Ehmed e  
dîsa hat meha mewlîdê  
Xudanê ava kewserê  
şefî'ê roja mehşerê

Mefxerê c'han serwerî  
dîsa hat meha mewlîdê  
Kî eger dirhemekî bide  
siba xwendina mewlîdê  
Xweda wê bihuştê bidê  
dîsa hat meha mewlîdê  
Bavê Isam'îl hezar selewat  
li serwerê pakîzat  
Mihemed fexrê kaînata<sup>1</sup>  
dîsa hat meha mewlîdê

ew



---

<sup>1</sup> . Bi Erebî فخر الكائنات

## E'ûzû bîllahî mînel Şeytanî rrecîm

### Bismillahî rehmanî rehîm

Sed hezar şukr û minnet û sena  
    ji xwedayê cîhanê re Rebê me  
Ji wê şûn de pir selat û pir selam  
    ser Mihemed Mistefa xeyrûll enam  
Ser mal û zaro û eşhabên kîram  
    ensar û mihacirê wî û hummam  
Min hewalda li pêşî navê Xweda  
    taku cefayê min li boşê bernede  
Bi zimanê Kurmancan û xweş û zerîf  
    bixwînim ji we re mewlîda şerîf  
Min riste danî eva bi 'ewnê xweda  
    belkî min ji Mistefa neke cuda  
Ta bimîne li nav Kurmancan eser  
    belav be li darê cîhanê serbiser  
Min bala xwe da li cîhanê her kesî  
    yanê bi Erebî, Tirkî, Farisî  
Nivîsandine mewlîda Mistefa  
    dixwînin, guhlêdinin pir bi sefa  
Rast bêjim ez wê sebê pir bûm hezîn  
    ez melûl bûm ji xwe re hem ey emîn  
Ço wê bi her zimanekî mewlîd hebe  
    bi zimanê me yê Kurmancî tunebe  
Paşê ez li ber xwedayê xwe gerîm

min got tu xaliqê me ye ya kerîm  
Îlhama dilê me ke tu çend şora  
ez hewaldim mewlîda xeyrolwera  
Min got ya Reb xwedayê zûll celal  
min jarî riswa meke layezal  
Ey birano dikim bikim şorekê  
kî eger va wesiyeta min bike  
Mexfîret ke wê xwedayê cîhan  
bike ji ummeta fexrûll murselîn  
Xwedê xelas bike ji Iblîsê le'în  
ji mekir û belaya wî bibe emîn  
Ez dikim ji heq Te'ala minnet  
wî xelas ke ji bela û miñnet  
Bi lavakê ruhê min ew şa bike  
bi lava xwedê qûlê xwe 'af dike  
Ya Îlahî tu were rehîmê li wan  
kî Bavê Sma'îl bipesine bi lava  
Ji gundê Beg Obesî ye ey bira  
miñtacê şefa'eta xeyrûl wera  
Ji qeza Çiyayê Kurdmancan e ewa  
bi lavakê derdê wî bikî dewa  
Pir feqîr û pir heqîr û pir neñîf  
muñtacê lavaa wî ye ewê ze'îf  
Kerme ke bike lavakê ey xoce  
ew gunehkar e pir û pir muñtac e  
Heq ti'ala rehmeta xwe li wî bikî

fatîhakê hebaya ruhê me bikî  
Kî dixwaze bihuşta 'alî meqam  
bi eşqê bibêjin esslat wesslam



## Elfatîhe

Were bira guhlêne vê hîkayetê  
    ji xudanê exbar bikim vê rîwayetê  
Hebû li Bexdadê jinek salîhe  
    'abîde û zahîde û nasîhe  
Rojekê hat vê cîhanê paşê derda  
    yê hate cîhanê bêguman wê here  
Mir bi şûn de zêrek li şûnê ma heman  
    çona bihuşt wê jê re nebe mekan  
Lawekî wê xatûnê salîh hebû  
    kar û kisbê xwe ta'eta xwedê bû  
Ew zêr ji dêka xwe de ma jê re  
    ketiye fikrê çona serfke bira  
Hîn di vî xeyalî de diçû ciwan  
    raste komekê hat heman  
Kom bûne dikin sefa û 'işret  
    dixwînin mewlîda şahê ummet  
Çaxa guh li mewlîdê na vê re heman  
    hêstirên xwînê ji çavan bûn rewan  
Paşê çû mala xwe ket xewa şevan  
    dît qiyamet bû di xew de nagihan  
Bang dike bangêr, kom dibin ins û can  
    dibêje here di bihuştê keve ya filan  
Kî hersal dewam dike li mewlîdê  
    herine bihuştê xwedê ferman didê

Qesreka bilind dibîne ew li wir  
wî camêrî pir dixwast rûne li wir  
Got hecî mewlîd kirî dere wir  
em niha îzna te nadin tu herî  
Ji xewê rabû heman wî dagirî  
dît çi ji wan re xwedê hazir kirî  
Bi wî zêrî mewlîdê bi xwendin dide  
xêratê dike xelkê xwarin dide  
Heya dimire her sal ew camêra  
Bi xwendin da wî mewlîda xeyrûl wera  
Hana got xelkê çaxa li ber candanê  
şad bû pir sekirin ew dikenî  
Bi şad û xendan ji vê cihanê derê  
ji vê cihana fanî ket seferê  
Çûn hekîm anîn sekir li wî nêrî  
ban kirin qewmê xwe gotin nemirî  
Bala xwe dayê cemala wî sekir  
aferîn pir ji kemala wî re kir  
Got cema'et, ev camêra î mirî  
xwedê nêriye li rûyê vî serwerî  
Pir nema çavê xwe vekir got heman  
dengekî got ey cema'et misliman  
Got xwedê ji min re tecellî kirî  
bi lutfê canê min teslî kirî  
Got berî mirinê çi da min xwedê  
cihê xwe li bihuştê herî bilind e



Şadûman bû, got sekin heva ez im  
     mewlîda Ehmed bikin hûn dem bi dem  
 Hana got û çav damrandin heman  
     qewmê xwe bû seba wî pir şadûman  
 Çaxa kir ji mewlîdê re hêmet  
     heq te'ala jî lê hat merhêmet  
 Ew çêroka xweş ta vir bû tamam  
     li ruhê Mistefa sed hezar salam  
 Kî dixwazin bibin ji êgir necat  
     ji eşq û şewqa wî re bêjin selewat  
 Bi eşqê guhlêne ey ixwanê dîn  
     hewaldim mewlîda xeyrûl murselîn  
 Pir bi xêr e mewlîda şahê Ereb  
     guh pê de ji can û dil de bi edeb  
 Ji pêxember hat ev rîwayeta  
     kî ji mewlîdê re bike hêmeta  
 Ez şefî'ê wî me roja meşerê  
     ewê vexwin ji ava kewserê  
 Got Ebû Bekir kî derhemekê  
     li xwendina mewlîdê belav bikê  
 Ew hevalê me ye li bihuştê  
     Mistefa wê lê bike şefa'etê  
 Got 'Umer ji mewlîdê re kî eger  
     hêmetê bike seba xeyrûl beşer  
 Dînê îslaman ew jîyan dike  
     ji pêxemberê xwedê ew hez dike

'Osmên got kî li rêka mewlîdê  
dirhemekê bi ridaya xwe bidê  
Wekî ew li cenga Bedir û Huneyn<sup>1</sup>  
bû şehîd zani be ey qurre 'eyn  
Got Elî El Murtda kî hêmet  
bike li mewlîda şahê ummet  
Bibe sebeb xwendina wê mewlîdê  
xwedayê nûrê îmanê bi wî de  
Vê hesab ew kê here va bihuştê  
li mehşerê nabîne ti ze hmetê  
Hesen Besrî jî got ez hez dikim  
qanderî çiyayê Uhud zêr kom bikim  
Li xwendina mewlîda xeyrûl beşer  
belav kim zêr û zîv û serbiser  
Ji Cinêd kirine rîwayet ey bira  
got kî were mewlîda xeyrûl wera  
Qedra mewlîdê mezin bike ewa  
zêde dibe îmana wî ey şîha  
Me'rûf El Kerxî got kî xazinekê  
seba mewlîdê ew hazir bikê  
Komekî ixwana çirakê vêxîne  
bîna xweş û pixûrê bişewtîne  
Seba xatirê wî şahê ummet  
li cîhanê nabînî tu ze hmet

---

<sup>1</sup> . navên du cenga ne di dema pêxember de: بدر وحنين

Fexriddîn El Razî got kî bixwîne  
bi ser xweyê û xwarinê de guhlêne  
Xwedê dike nava wir bereket  
him li xudana dike mexfîret  
Wekî van kesan piran wesif kirî  
qedra mewlîda wî xweş pêxemberî  
Wek îmamê Şafi'î 'alî humam  
kirî wesfa mewlîda xeyrûl enam  
Xwedê razî be ji van kesina  
ji ummeta fexrê kaînata  
Nemaze ji her çar îmamên mezheban  
razî be ji wana û xudî 'eba  
Me ji şefa'eta wan mehrûm nekî  
li ber mirinê îmanê bi nesîbê me kî  
Lê biborî gunehê me gişan ecme'în  
ya dayîk û bavê me û mumînîn  
Razî bî ji gişan rebbil 'alemîn  
bi hürmeta enbiya û murselîn  
Lê biborî gunehê me vê civatê  
bi fedlê xwe li me werî merhmet  
Bi hürmeta wî hebîbî ey xweda  
me li mehşerê ji wî meke cuda  
Kî dixwaze bihuştta 'alî meqam  
bi eşq bêjin esslat û wesslam



## Pesna Fexrê Kaînat li ser wî baştirîn selewat

Tu bi xêr û selamet hat	mewlîda fexrê kaînat
Ez bi qurban wî pakîzat	were guh li mewlîda wî ne
Hebîbê min li vê mehê	cîhan kir şewq û ronî
Bixwîn mewlîda wî şahî	were guh li mewlîda wî ne
Ji derdan re şifa ye ew	Mihemed Mistefa ye ew
Ji cana re sefa ye ew	were guh li mewlîda wî ne
Çi xweş e mewlîda Taha	bi bext û şan e ev meha
Bi qurban wî ke xwe niha	were guh li mewlîda wî ne
Bûye aşiq dilê xemgîn	cemala Ehmedê rengîn
Civat ji we re mizgîn	were guh li mewlîda wî ne
Li meha mewlîdê cana	bîna bax û gulistana
Dihêrike wekî rîhana	were guh li mewlîda wî ne
Hezar selat kerem kanî	li ser te fexrê cîhanî
Şefa'et ez bi wî mêvanî	were guh li mewlîda wî ne
Binêr Minle Elî ey can	bi eşqê xwe kirî qurban
Li derdê wî bike derman	were guh mewlîda wî ne



**Çêroka mewlîda şerîf**  
**bi zimanê Kurmancî û zerîf**  
**Fedîleta mewlîdê bi zimanê Kurmancî hewaldide**

Wer bixwîne mewlîdê ey bilbilê  
          hewlda ji me re qedra wê gulê  
Çi heye li nav baxçê nubûwet  
          xeber de mewlîda şahê ummet  
Şa bike tu carekê rûhê aşiqan  
          berde şewqa wî di dilê sadiqan  
Kî guhlêne şa dibe can û ruhê xwe  
          pir zêde dibe dîn û îmana xwe  
Selef hîkayeka rind bibêje were  
          bi şora mewlîdê de paşê here  
Qedra mewlîdê çi ye ta zani bin  
          hecî bi dest de heye bi xwendin bidin  
Li Bexdadê kesekî salîh hebû  
          'abid û zahid û ehî teqwe bû  
Her meha Rebî'îl Ewwel mewlîda  
          Mistefa wî camêrî bixwendin dida  
Li rêka wî canê xwe fîda dikir  
          bi eşqa wî warê xwe qurban dikir  
Çaxa tê her sal va miha mewlîdê  
          seba xatirê wî şahî dike 'îdê  
Cîranekî wî û Cihû hebû  
          têkliya xwe tim bi Îslamê re bû

Xatûna wî Cihûyî gotê rojekê  
ev cîranê me 'eceb tim çî dîke  
Her meha Rebî'il Ewwel hate ser  
xêr û xêratê dîke ew serbîser  
Cihû got zani be wê ey nîgar  
Mistefa mehbûbê xwe ye pir kibar  
Ehmed û mixtar e navê wî zatî  
ji tevahiya cîhanê re ew hatî  
Li danzdê vê mehê ew şahê gezowîn  
li şeva duşemê fexril murselîn  
Bûye ji dêka xwe ew heyva tamam  
Avête ba cîhana bilind meqam  
Seba wî zatî eva dîke 'îdê  
ewqas ne'met ew li rêka wî didê  
Dema navê wî dibîse ew jina  
ji eşqa wî re aqil vê re nema  
Wê çaxê gihîşte wê eşqa Mistefa  
tijî bû dilê wê ji zewq û sefa  
Wê şevê xew kir bi şewqê xatûnê  
di xewnê de fexrê cîhanê dibîne  
Ketiye şoran ew û eshabên xwe  
Guh lêdînan al û hem êhabên xwe  
Got kî ye wê demê ev hêva tamam  
kî ye ev şahê xudan bilind meqam  
Wan vê re got eva Muhemed e  
mehmûd û mixtar û taha Ehmed e

Xatûnê dayê selam pir bi edeb  
bir selama xatûnê fexrûl Ereb  
Wê demê wê banê kir got ya resûl  
mistefa vê re got lebbeyk bi usûl  
Dagirî xatûnê hawara wî kir  
ez qûlê te me Mihemed min çi kir  
Bi min re "lebbeyk<sup>1</sup>" te got çî ye sebeb  
ey letafet me'denê kaniya edeb  
Vê re got paşê şefî'el muznîbîn  
ew hebîb e, rehmeten lîl'alemîn  
Madama bi eşq te kir pesna resûl  
Zani be cenabê heq tu kir qebûl  
Kurkê îmanê jî da te Êhed  
tu ji ummeta min e ta ebed  
Hewalda şertê îmanê Mistefa  
bi sidqanî hat îmanê kir pir sefa  
Paşê ji xew rabû wê kir ah û wah  
got li rêka Mistefa canê min fîda  
Ji Cihû re hewalda ev şora  
wî zanî jin çûye ba xeyrûl wera  
Çinkî di xewnê de wî jî wek jinê  
dîti bû cemala wî şahê mezin  
Vê re got min di xewnê de wekî te dît  
rûyê te li ber xakpaya wî min dît

---

1. لَيْبَيْكَ .

Ez aşiq cemala wî bûme heval  
    dilê min pak bû bi nûra layezal  
Bi eşq û şewqa wî zatî pir kemal  
    dînê îslaman qebûl bikin delal  
Ji xwedê re em bikin pir ta'et  
    em bikin mewlîda şahê ummet  
Man li ser soza xwe bi qewl û qerar  
    dînê îslaman ji wan re kirin aşkar  
Salê carekê mewlîdê bixwendin didin  
    şîva xweş bi xelkê bixwarin didin  
Madema hûrmet kirin li mewlîdê  
    heq te'ala nûra îmanê didê  
Seke qedra mewlîdê bilind humam  
    bermede ji destê xwe tu sibeh û şem(şev)  
Kî rica dike ji wî şefa'et  
    bike ji mewlîdê re hûrmet  
Ev çêroka paşî hat ey bextewar  
    qedra mewlîdê mezin bike dilo  
Ji kesî re namîne fanî cîhan  
    kanî ew pêxemberê axir zeman  
Ger tu hez dikî ji şahê Mistefa  
    bermede sinneta wî ey bêwefa  
Kî dixwaze bihuşta bilind meqam  
    bi eşqê bêjin esslat wesslam  
Mefxer mewcûdat ji Mihemed Mistefa re selewat





**Pesna fexrê kaînat jê re baştirîn selewat**  
**Û çar yarên mezin redwan ellah te'ala li ser wan**  
**hemiyân be**

Aşiqê navê te me ez hawar Mihemed Mistefa	
Hem xakpaya te me ez	hawar Mihemed Mistefa
Tu yî ew şahê cîhanê	xudanê lutf û keremê
Nav li ser lûhê û qelemê	hawar Mihemed Mistefa
Nav û şana te çi rind e	qedra te 'alî bilind e
Ji zemînê û ta ezmên	hawar Mihemed Mistefa
Tu hat bi wehî û rîsalet	cîhan keti bû zulmet
Te giş kirin hîdayet	hawar Mihemed Mistefa
Tu eşrefê ins û can î	tu me'sûqê aşiqan î
Tu ji ewladê Ednan î	hawar Mihemed Mistefa
Mewlîda te li sala Fîl e	tu ji nesla Sma'îl e
Tu ronîya çavê Xelîl e	hawar Mihemed Mistefa
Çêkir wî kewn û mekanî	seba xatirê te zî şanî <sup>1</sup>
Kemala te xwedê zanî	hawar Mihemed Mistefa
Çiqas misliman hene	em giştik motacê te ne
Miştacê dîndara te ne	hawar Mihemed Mistefa
Çiqas însan hatin fanî ne	çiqas çûn baqî ne
Tu serwer î, li ser gişan î	hawar Mihemed Mistefa

1. ذو شان .

Li nav ewqas enbiya	tu çêtir e li ser hemiyan
Tu yî ew nûra kibriya	hawar Mihemed Mistefa
Can û serê min fîda be	li rêka we enbiya be
Tu li nav wan afita be	hawar Mihemed Mistefa
Tu yî fexra du cîhana	li ser cîhanê siltan e
Şefî' bike mislimana	hawar Mihemed Mistefa
Resûlê me bilind şan e	derbas bû heft qat ezman e
Çû cem rebê xwe rehnman e	hawar Mihemed Mistefa
Mihemed xudanê tacê	şeva Îsra çû Mi'racê
Ji ummetê re bû racî	hawar Mihemed Mistefa
Resûl rebil 'ezzet e	çû cem bi rica û minnetê
Seba 'asiyên ummetê	hawar Mihemed Mistefa
Taha menbe'a edebê	şeva bîst û heftê Recebê
Borîn ji me re kir teleb	hawar Mihemed Mistefa
Vê re got "lewlak lewlak"	me çê ne dikirin ev eflak
Seba xatirê te zatî <sup>1</sup> pak	hawar Mihemed Mistefa
Ebû Bekir sidîqê te	heval û yarğarê <sup>2</sup> te
Mezinê çar yarên te	hawar Mihemed Mistefa
Ew yek hedret Umer e	li ser dîn rehber e
Hakimê textê Qeyser e	hawar Mihemed Mistefa

<sup>1</sup> نفس، ذات .

<sup>2</sup> صديق الغار (الكهف).

Yek jî hedret Usman e	ew hem komkerê Quraan e
Can û serê min qurban e	hawar Mihemed Mistefa
Ew yek Heyder kerrar e	şêrê xwedayê cebbar e
Xudan şûr û zûlfeqar e	hawar Mihemed Mistefa
Kî bi rêka we de here	xar nabe ew li mehşerê
Wê vexwe ava kewserê	hawar Mihemed Mistefa
Pir xeta kî ji ummetê	dike rica û minnetê
Mehrûm meke ji şefa'etê	hawar Mihemed Mistefa
Dilo bêje selat û slam	li ser te ya xeyrûl enam
Li ser eshabê te û kîram	hawar Mihemed Mistefa
Ew li ser al û ensara	ew mihacirê bi te re
Bi qanderî pelên dara	hawar Mihemed Mistefa
Li ser hemû enbiya	li ser al û eshaba hemiyan
Li ser hebîbê kibriya	hawar Mihemed Mistefa
Bavê Sma'il hawar dike	şefa'et rica dike
Çima tukes xelas nake	hawar Mihemed Mistefa



## Derbeyan qesîda mewlîdî şerîf

### bi zimanê Kurmancî û zerîf

Yê dixwaze lutf û îhsana xwedê  
wer guhlên mewlîda pêxember were  
Yê dixwaze rehmêt û fedla xwedê  
wer guhlên mewlîda Mihemed were  
Şeva ew resûla bûye vê guman  
nêzîk li şeva qedrê kir heman  
Tu dixwazî ji dogehê eman  
wer guhlên mewlîda Mistefa were  
Ey birayê dîn bibêje herdem mudam<sup>1</sup>  
sed hezar jê re selat û hem selam  
Tu dixwazî bihuşta bilind meqam  
wer guhlên mewlîda Ehmed were  
Ger dixwazî ji barî<sup>2</sup> weslet  
û ji pêxemberê wî şefa'et  
Ger tu hez dikî sefaya Bihuşt  
wer guhlên mewlîda Taha were  
Bêguman rûh wê here ji qefesê  
bermede li bêhûdê<sup>3</sup> tu nefesê  
Heya niha te çî kir tu bû 'asî

---

1 . دائم

2 . الباري

3 . بدون فائدة

wer guhlên mewlîda Ehmed were

Madem tu kê ji vê cîhanê herê

çima tu nakî zexîra wê seferê

Tu kê vexwî ava hewda kewserê

wer guhlên mewlîda Mihemed were

Bala xwe pê de binêr tu bi çava

ev cîhaneke wekî xewna şeva

'eceba ji kê re maye heva

wer guhlên mewlîda pêxember were

Pir însan hatin vê cihanê û çûn

li encamê derbas warê beqayê bûn

Kanî Mûsa kanî Îsa ka Harûn

wer guhlên mewlîda Mistefa were

Ger tu hez dikî bira ji Mistefa

û ji çar yarên wî û bi wefa

Tu kê bikî li bihuşt bilintir sefa

wer guhlên mewlîda Ehmed were

Bike tu hûrmet û te'zîm edeb

li meclîsa mewlîda fexrûl Ereb

Kê ji cîhanê wefa dîdtiye 'eceb

wer guhlên mewlîda Ehmed were

Sed hezaran selewat û him selam

li ser Mihemed Mistefa xeyrûl enam

Û li ser Eşhab û alê wî û kîram

wer guhlên mewlîda şahê were

Bavê Sma'îl rica û minnet

dike ji cenabê şahê ummet

Pirqusûr e dixwaze şefa'et

wer guhlên mewlîda Mistefa were

Kî dixwaze ji xweda bilind meqam

bêje bi eşqê esslat û slam



## Derbeyan pêşiya mewlîda şerîf bi zimanê Kurmancî û zerîf

Sed e'ûzû li boyî Şeytanê recîm  
min got bismillahê rehmanê rehîm  
Em zikir kin li pêşî navê xwda  
guh pê din ji dilê xwe da  
Li serê her karekî navê xweda  
ya tu bike ji ser zimanê xwe bermede  
Navê wî ji eşqa xweda bad bikin  
ji wî re zikir û îbadetan bikin  
Her nefesekê navê heq bêje dewam  
her kar bi navê xweda dibe tamam  
Were ser zimanê kê navê xwedê  
çi mirazê bixwaze ewê bidê  
Kî navê wî zikir dike pak dibe  
her karekî ji wî re hêsan dike  
Carekê bi şewq bêje Ellah ziman  
diweşin guneh wekî pelên daran  
Hecî navê wî zikir ke pak dibe  
ber mirazê her mirazekî dibe  
Bi eşqê wer em bêjin Ellah kerîm  
ya xudanê zemîn û ezmana rehîm  
Belkî were rehmetê li me îlah  
ew kerîm û ew rehîm û padîşah  
Yek ew e xwedayê me ye vê guman

wî çêkir giş mexlûqat û ins û can  
Qadir e, çêkir ewqas kewn û mekan  
wî xwedayî bi xîtaba "kun fekan"  
Ew hebû qet tunebû ev cîhana  
tinebû lewê û qelem û Adema  
Ew hebû qet tunebû ins û melek  
'erş û ferş û hêv û roj û çerx û felek  
Ew hebû berî semawat û zemîn  
ji ezel de ew e rebil 'alemîn  
Bi destê qudretê wî eva çê kir  
yek bona wî giştika îqrar kir  
Qadir û qeyûm e, ewa vê qusûr  
zikra wî dikin hemû hov û tilûr  
Bê çax, bê mekan û bê heval  
vê şîrîk û vê nezîr û vê heval  
Li cîhanê çî heye ew pê zane  
her hikmetek a wî ye bi hertiştî kane  
Daye hin qûlan tac û kincê herîr  
hin nabînin li bin xwe rêxin hesîr  
Hin li ser textê zêrîn dikin qerar  
hin ji toz û kulxanê dikin fîrar  
Hinan ew dike beg û hinan feqîr  
hinan dike zîndanê hinan esîr  
Hinan radike dibe ezmên  
hinan ew davêje bin axa zemîn  
Hin nabînin li xwe kin kevnê 'eba



hin naxwazin li xwe kin şal û keba  
Mebêje ev zengîn e eva xizan e  
bala xwe pê de kî wilo dike hele  
Hin gawiran tîne Îslam dike  
hin Îslaman dibe gawir dike  
Aqilê kesî nagihîne karê xweda  
giş yek in li ba wî zengîn û geda  
Ez çî kesim û wesfa Barî ji we re  
xeber dim paşî netê qet ey bira  
Xelk û 'alem 'aciz e hewal bide  
kes nikane xeber bide wesfa xweda  
Barê şora zêde nekim ez gida  
yek e ew xêrjîwî tunene xweda  
Kî dixwaze bihuşta bilind meqam  
bi eşqê bêjin esslat û slam



## Pesnandina Fexrill Murselîn

Ez bi qurban canê te bim Mihemed  
ez bi qurban serê te bim Mihemed  
Berî ez te bibînim şewq û eşqa  
te bi canê me kar dike Mihemed  
Ola tu pê hatî çî musteqîm e  
ji eşqa te re canê min seqîm e  
Cemala te ji derdê min re hêkîm e  
ez bi qurbana cemala te Mihemed  
Tu yî eşrefê xelkê vê cîhanê  
tu bû xatim giş pêxemberan î  
Qedra te pir bilind e xwedê zane  
va canê min fîdayê te Mihemed  
Xwedê bi te re got "lewlak lewlak"  
hebîbê min, min çê ne fikir eflak  
Seba xatirê te xudan exlaqa pak  
erd û ezman xwedê çê kir Mihemed  
Tu Mehmûd û Mihemed û Mistefay î  
şefa'eta te li derda şîfa ye  
Ev bêçara qûlekî pir xeta ye  
bi destgirê wî be Mihemed  
Çî derman e, xakpaya te şahî  
xwedê kirî wesfa te padîşahî  
Li roja mehşerê va roja reş  
xîcil meke şefî'ê min Mihemed

Bi şef û roj dikim feryad û zarî  
    xelas ke min ze'îf û şermezarî  
Siba li dergeha xwedayê barî  
    hawar dikim hebîbê min Mihemed  
Çiqas dar û ber hene bi qelem bin  
    çiqas derya hene bi merkeb bin  
Çiqas ins û cin hene bi katib bin  
    nikanin wesfa te binivîsin Mihemed  
Bavê Smaîl dike ji te ricayê  
    ketî bin emrê Iblîs û hewayê  
Li derd û kulên wî bike dewayê  
    tu yî dermanê her derdan Mihemed  
Bi hezaran selat û pir selama  
    li ser te û li ser eşhabê kîrama  
Li ser pêxember û ruslê 'îzama  
    tu ye baştirê wan gişan Mihemed  
selata me li ser hemî enbiya be  
    nemaze li ser nûra kibriya be  
li ser eşhab û alê we gişan be  
    tu yî eşrefê wan gişan Mihemed

## Serê mewlîda şerîf

Vê hesab hemd û sena ji barî ra  
em kirine ummeta xyrûl wera  
Ne ji wî ba me ne didît va dewleta  
di sayê de em ketin se'adeta  
Hat em xelas kirin ji zulmet  
anî der 'alem wî ji cehalet  
Sed hezaran şukir û minnet ji wî re  
fexrê cîhan Mistefa şandî ji me re  
Bi zimanê Kurdmanca mewlîda şerîf  
hewaldim bûndina wî şahê zerîf  
Wer guhlên ji eşqa xweda ey bira  
ez xeber dim mewlîda xeyrûl wera  
Çinkî namîne ji min re ev mala  
ez jî rojekê herime bi axa gora  
Mirin bû em kes namînin li vira  
encamê em gişkê herin wira  
Wex ji bira, yê berdide vê firsetê  
berdide tidareka axretê  
Kî dixwaze dewltdar bin wer  
guhlêne tu mewlîda xeyrûl beşer  
Kî ji mewlîdê re bike hûrmet  
wê canê xwe bike layiqê rehmet  
Min jî xwast ez jê re bikim hûrmet  
belkî ew li me bike şefa'et

Taku ixwanek du'a li min bike  
bi du'aya wî xweda li min 'af bike  
Ey birano li qusûrê menêrin  
çinkî niqsanên vî 'acizî pir in  
Gora hâlê xwe me nivîsand tamam  
min nezim kir mewlîda fexrûl enam  
Ez rica dikim ji we îxwana  
kî bibîne lê eger nuqsana  
Bi dest û qelemê xwe rast bikin  
navê min bi nexweşî zikir mekin  
Heq ti'ala rehmet bike li wan  
kî Bavê Smaîl pesin bike bi du'a  
Pir heqîr û pir feqîr e pir ze'îf  
gorna wî pir nûr bike hey û letîf  
Ey cema'et win bikin hêmd û sena  
dawî li me were rehma Rebbena  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşqê bêjin esselat û slam

\*\*\*

Bixwîne ey bilbilê şeyda hemîn  
hate çaxa me'sûqa tu nazenîn  
Gul vebûn, çiçek vebûn hat Buhar  
şorekê bike bimîne yadîgar  
Giş zanin tu bûye aşiqê gulê  
wer hewalde va şorê xweş bilbilê

Ji te re jî namîne fanî cîhan  
     kanî ew pêxemberê axir zeman  
 Bi eşqa wî dilê me pir şad bike  
     miştaqa cemala wî û pak bike  
 Rind guhlêne mewlîda xeyrûl enam  
     şad bike can û rûhê xwe ey hûmam  
 Guh pê de ev mewlîda şahê mezin  
     hewaldim ji te re ey ixwanê dîn  
 Hebû ew xwedayê barî vê guman  
     tunebû heft qatên erdê û ezman  
 Ew hebû qet tunebû çerx û felek  
     ins û cin û 'erş û kursî û melek  
 Xêrjî wî kes tunebû boş bû cîhan  
     xwast xwe bike ji 'alemê re xuyan  
 Nûreke pak çê dike ew padîşah  
     bi navê wê nûra pak re got Hebah  
 Ew nûrê bû ruhê pak ê Mistefa  
     ji wê hat erwahên hemû enbiya  
 Ji ew nûra pak bû xitm el murselîn  
     ji wê nûrê bû şefî'il muznîbîn  
 Berî va kewn û mekanê çê bike  
     heft hezar sal ew nûra pak çê dike  
 Ji wê derket aşikare û nihan  
     erd û ezman, 'erş û kursî, ins û can  
 Ewqas sal tertîb daye bi qudret  
     taku ew li wê bike şefa'et

Heya hêşrê were gotin ev şora  
sed hêşir bibe paşî netê bira  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin eslat û slam



**Pesna hedretî resûlillah**  
**Nimêj û silava Xwedê lê be**

Ez bi qurban navê te û şêrîn bim ya resûlillah  
ez bi heyrana çavên te û reş bim ya resûlellah  
Cenabê heq tu rehmêt şand ji hemû mexlûqat re  
dixwazim ez şefa'et xelas bim ya resûlellah  
Tu yî şahê giş pêxemberên hatin darê cîhanê  
birin hêv û rojê nûr ji rûyê te ya resûlellah  
Li ser kesî tune ye ya Mistefa husn û cemala te  
tu kes wekî te qet netê ya resûlellah  
Cîhan çê ne dibû ger tu ne hati ba vê cîhanê  
seba xatirê te çêkir wî xwedayî ya resûlellah  
Şeva mi'racê tu çû gerê li heft qatên ezmanan  
tu çû gihîşt qabe qewsên te tewaf kir ye resûlellah  
Tu wê şevê bi xwedayê xwe re ket mukalemê  
çi dewlet û çi rif'et ji te re ye resûlellah  
Bi te re got ya Mihemed hemû hev kaînatina min  
seba te anîn wicûdê zani be ya resûlellah  
Xêrî te kesî ne dît Barî bi çavên seran ya Ehmed  
ji piran tu yî hebîbê heq te'ala ya resûlellah  
Wî da te dewleta şefa'et seba gunehkar  
tu bû dermanê hemû derd û kelîme ya resûlellah  
Tu kêf û zewq û 'işret qet ne kir li vê cîhanê  
te got li cîhanê wek xerîban bin ya resûlellah  
Ze'îf û micrimin em, guneh me kirine vê hêd



hêviya me li hêşrê û neşrê tu yî ya resûlellah  
Rûyê me tunene em bixwazin ji te şefa'et  
te got ez şefî'ê gunehkara me ya resûlellah  
Ji bavê me dilrehimtir î, ey kerem kanî  
mirwet merhêmet layiqê te ye ya resûlellah  
Me mede dest zebaniyan meşewtîn me li dogehê  
xeta û 'isyanên me vê paşî ne ya resûlellah  
Rica dike ji te va qûlê 'aciz û ze'îf miskîn  
wer carekê ziyart ke rewda te ya resûlellah  
Eger tu me xelas nekî xêrî ji te emê herin ba kê  
kî wê li hâlê me bêkesan seke ya resûlellah  
Bi vê qesîdê min medha te ne kir emma welekên  
min qesîde bi navê te mediha kir ya resûlellah  
Rica dike Bavê Smaîl şefî'il muznîbîn Mehmûd  
seba wî bîr meke li roja hêşrê ya resûlellah  
Dike selat û silavan vê hed li ser zatî pak  
karê wî cirim û 'isyan in ya resûlellah

\*\*\*

Wer guh bide ji vê şorê xafil mebe  
bi hewayê nefsê de meşgûl mebe  
Mirinê wîne bîra xwe her demekê  
ey birayê min hajêkê tu wê ji bîr dikê  
Bermede ji dest xwe tu vê xêrê  
siba xwe poşman neke tu li wirê

Zani be eslê vê cîhanê çî ye  
ew zemîn û ezmana ji çî xuliq bûye  
Çaxa ruhê Mistefa li vir hebû  
wê çaxê navê Adem qet tune bû  
Ew hebû berî werin giş enbiya  
sûreta wî şahî ma li paş hemiya  
Çiqas hene enbiya û murselîn  
ji nûra wî şahî xulq bûn icme'în  
Paşê ew hat bû serdarê hemiya  
paşê ew bû hebîbê kibriya  
Guhlêne pêşiya vê şorê ey bira  
ez hewaldim çona bû xeyrûl wera  
Wî xwedayî got ya Cibrîlê emîn  
here pençek ax wîne ji ser zemîn  
Wê çaxê ew hat şûna gora resûl  
pença xwe vêxist û jê bir bi usûl  
Wê çaxê pir pak wesif dibû bira  
anî bi ava nesîmê istra  
Dema ji wê ava pak ew hate der  
sankê tiştêkî pir ciwan bû ey pider  
Paşê bir şuşt wî bi ava bihuşt  
lê temaşe kir xweda bi qudret  
Belav bû ji tirsê wê re ne kir qerar  
dilop dilop bû sed û bîst û çar hezar  
Ji dilopekê pêxemberek çê bû  
çiqas pêxember hene ji nûra wî bû

Paşê bi heriya Adem ew istra  
pir salan sekinê ew li wira  
Bedena Adem ji wê heriyê çê kir  
anî li ser raha firîştan çekir  
Anî danî pêşiya deriyê bihuşt  
taku firîşte bibin jê 'ibret  
Çaxa ferîştan hewa dît li wira  
şad û xendan bûn ji xulqet bira  
Pir nema Şeytan jî tê û derbas dibe  
ji boyî Adem hevîrê xwe dibe  
Nihêrî bi hevalê xwe re got sekin  
hûnê bêjin çi vî bi baştirê we kin?  
Gotin emê emir û fermana xwedê  
bigrin ger xwedê çi fermanê bide  
Wê demê bi nefsa xwe re got binir  
ev bi çêtirê min be eger  
Ez jê re nakim qet tu îta'et  
ev çî ye ez jê re bikim hûrmet  
Lo eger ez kê bi serdarê vî bim  
wê çaxê ezê hema helak bikim  
Paşê ferman da xwedayê zûl celal  
bi firîştan re got hey û layezel  
Got ji Adem re bikin secde hemîn  
gişan secde kir xêrjî Iblîsê le'în  
Fermana Rebil alemîn nekir qebûl  
bû sezayê le'net hem bû cehûl

Got va canê min ji êgir xuliq kirî  
cara agir ji axê re secde kirî  
Carekê bala xwe bide vê hîkmetê  
bifikire ji xwe re bibe 'ibretê  
Bi wê kibrê bû sezayê le'netê  
bi hêseda xwe derket ji bihuştê  
Serdarê firîştan bû li ezmên  
seke ket çî hâlî Şeytanê le'în  
Ey bira saqin tu jî kibrê dikî  
paşê xwe mistehîq agirê wê dikî  
Heya heşirê were gotin ev şora  
sed heşir bibe paşî ne tê bira  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin esslat û selam



## Salixa(wesfa) Pêxember

Navê Mihemed çiqas şêrîn e  
    bejna Mihemed çi nazenîn e  
Binêr li cemala wî pir kemalî  
    wekî hêva li ezmên e  
Wekî wî zatî bilind sîfatî  
    qet kes nehat rûyê zemînê  
Can bi qurbane fexrê cîhanê  
    ew bû siltanê zemîn û ezmên e  
Roja sibê ye, hêva şevê ye  
    nûrûl huda ye, Taha el emîn e  
Bavê Sma'îl niha bûye saîl  
    heq bikî naîl penahî dîn e  
Tu ji jiyanê heya mirinê  
    Li ser wî selatê herdem werîne



## Mefxer mewcûdat Mihemed Mistefa selewat

Guhlêne vê şorê ey xudan nezer  
ez kê hewaldim rûhê xeyrûl beşer  
Ev cîhan tijî bû ji cehalet  
kes nema giş keti bûn delalet  
Dara kifrê hate der li ser zemîn  
mişrik û gawiran girtin rika dîn  
Dar û ber kirin xwedê pê bawer bûn  
kevir û ar kirin xwedê muşrîkûn  
Ew zemana gihîşte vê derecê ta  
peyda bû ji xwedê de va îrada  
Were cîhanê Mihemed Mistefa  
xelk û 'alem giş bikin zewq û sefa<sup>1</sup>  
Guhlêne tu şana wî pêxemberî  
fexra cîhanê wî bilind serwerî  
Emir rûhê Mistefa kir zûl celal  
ew kerîm û ew rehîm û vê heval  
Got here cem qûlê min bibe resûl  
bila ewna Raha bikin qebûl  
Derxîne wana ji delaletê  
bê xwedê yek e wîne hîdayetê

---

الذوق والصفاء . 1

Ger tu wan miştaq cemala min bikî  
tu gişan wînî di rêya rast kî  
Ezê Cibraîl bişînim ji te re  
û Bûraq û Refrefa xeyrûl wera  
Wê wîne Buraqê tuyê li wir lînî  
wê te wîne li 'erşê bilind dîne  
Tuyê li erşa min seyran bikî  
tuyê li kursiya min cewlan bikî  
Çaxa bihîst şora xwedê şahê Erebb  
da xwedayê xwe bersiva wî bi edebb  
Vê re got ya rebbene ya zûl celal  
ez qûlê te me kerîm vê mîsal  
Tu jî gerek e bidî min birhanekê  
heqbûna doza min beyan bikî  
Wê demê got padîşahê layezal  
qadir û hey û rehîm û bê heval  
Te çi xwast bike beyan ez hazir im  
û li kû min bixwazî ez qadir im  
Çi gerek te be ez zanim heman  
te çi xwast ezê bikim wê vê guman  
Ezê bişînim wê quraana mubîn  
wê ji te re wîne Cibraîlê emîn  
Paşê ez kê bidim te pir mu'cîzat  
wekî te xwast giş wê bibe beyînat  
Heya heşrê were gotin ev şora  
sed heşir bibe paşî netê bira

Kî dixwaze rehmata rebbûl enam  
bi eşq bêjin esslat wesslam  
Yeka din zimanê min dike beyan  
neslê wî hebîbê pak dike 'eyan  
Guh pê de ez 'aciza bidimm xeber  
kî bûn dayîk û bavê xeyrûl beşer  
Çû ser kê nûra Mistefa  
hat li cem kîjanî wan kir sefa  
Xweş guhlêne tu nûra wî serwerî  
ez bi qurban canê wî pêxemberî  
Heq ti'ala canê Adem xeliq dike  
taku va cîhanê bi wî şîn bike  
Bi nûra Mistefa hatin giş melek  
secde kirin yek bi yek xwastin dîlek  
Nûra hedretê Ehmed pir werdikar  
li eniya Adem dike wî aşîkar  
Ew bi nûra Mistefa gihîşt dewlet  
ew bi nûra mucteba<sup>1</sup> ket cinnet  
Sekinî li eniya gelek ro û zîkar  
li dawî li wê derê nake qerar  
Ji eniya wî nûra xeyrûl beşer  
li eniya Hêwa dêka me hate der  
Ji eniya Hêwa nûra saheb cemal  
çû ser eniya Şît kir zûl celal

---

كلمة عربية: المجتبی .<sup>1</sup>



Ji eniya hedret Şît ew bar dike  
     yek bi yek pêxember derbas dike  
 Paşê anî ew nûra rebil celîl  
     çû ser eniya Îbrahîm Xelî  
 Nese kinî li wir dîsa nûra celîl  
     wê çaxê bar dike eniya Sma'îl  
 Hêviyên eniya van her du zatina  
     zêde bû ew nûra pir bû aşîna  
 Encamê paşê nûra bedrill duca  
     nese kinî li eniya van gişan Xoca  
 Hat eniya Ednan û Me'd û Nîzar  
     li eniya wana jî nekir qerar  
 Çû eniya Midir û Ilyas mudreke  
     li eniya wana jî nese kinî seke  
 Hate cem Xezîme Kînan û Nedîr<sup>1</sup>  
     paşê dere eniya Malêk û Fehîm  
 Çû eniya Xalib û Luey û Ke'ib  
     diçû cem kê dibû eşrafê Ereb  
 Ji eniya wan hilîna rebê rehîm  
     intîqal kir eniya Murra û Hekîm  
 Dere eniya Qusey û Ebdê Munaf  
     hat cem kê firişta dikir tewaf  
 Li eniya vana gişan qerar nekir  
     paşê intîqal ser eniya Haşim dikir

---

1. اسماء عشائر قديمة.

Li cem wî jî nesekinî nûra hebîb  
hat bû mêhvan li Ebdilmuttelêb  
Ewa bû kalê Mihemed Mistefa  
sekinî li eniya wî kir pir sefa  
Hate cem vana gişan nûra emîn  
wiha bûn kalikên fexirûll murselîn  
Qerar kir li eniya gelek zeman  
paşê ji eniya wî jî bar kir heman  
Hate ba Ebdella bavê mucteba  
sed hezaran jê re gotin merheba  
Çaxa Edbilmuttelêb nûr dît heman  
li eniya bavê Taha bû şadîman  
Li xizmetê radibe her demekê  
canê xwe li raña<sup>1</sup> wî fîda dike  
Çawa fîda neke canê xwe ey heval  
pir şêrîn bû ew xudan husn û cemal  
Çaxa Ebdella camêr bû ey ezîz  
pir jin aşiq wî bûn û pir qîz  
Belav bû cemala wî li pir dera  
pir qîzan dixwaze bavê wî jê re  
Naecbîne ew wana gişan  
ew nabin dayîka xatemill enbiya  
Yek hebû ji dewlemendên wan Ereb  
ji Medîne navê wî Weheb

---

الراحة. <sup>1</sup>

Wê çaxê qîzeka wî pir rind hebû  
     û cemala wê li ser kesî tunebû  
 Navê xwe Emîne bû qîza Weheb  
     ewa kê bibe dêka fexrûll Ereb  
 Weheb rojekê ji Medînê kir sefer  
     hat ziyaret ke bavê xeyrûll beşer  
 Çaxa hat Mekkê li rê raste wî hat  
     dî eniyê nûra fexrê kaînat  
 Her du hatin mala Ebdilmuttelêb  
     jê re pir hûrmet kirin wan ey edîb  
 Soza Emînê danê qewl û qîrar  
     nikeha her duyan kirin aşîkar  
 Wê demê kirin daweta her duyan  
     zave bû Ebdellah Emîne bû bûk  
 Anî mal wana kirin zewq û sefa  
     ewna bûn dayîk û bavê Mistefa  
 Heya heşrê were gotin ev şora  
     sed heşir bibe paşî netê bira  
 Vê hesab bikin selat û pir selam  
     li rûhê pêxemberê me sibeñ û şem(şev)  
 Ser al û eşhaba û hem mihaciran  
     ji zaro, jin û piştgirên wî re  
 Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
     bi eşq bêjin esslat û selam



## Salixa Resûlillah

Hate der nûra te Ehmed  
Wek cemala te Mihemed  
Hêv û roj tu yî Muhemed  
Tu hebîbê me ye Ehmed  
Tu yî taha tu yî yasîn  
Tu yî tahir tu yî mixtar  
Ji nûra te bû giş enwar  
Qedra te bilind e Mehmûd  
Tu yî metlûb tu yî meqsûd  
Ya Mihemed ya hebîbî  
Tu wesîla min xerîbî  
Ez feqîrê pir xeta me  
Ez bi derdê vê derman im  
Bavê Sma'îl dinale  
Dixwaze ji we weslê  
Bi şev û roj ya mumeccêd  
Sed hezaran ya mueyyêd  
Mefxerê mewcûdat

hêv û roj xwe kir nihan  
nûra te da cihan  
tu xudanê zemzemê  
tu îmam el qubletên  
tu yî kalkê Husên  
rehmeten lîl'alemîn  
ya şefî'il muznîbîn  
da te wî fedl û kemal<sup>1</sup>  
tu xudan ê husn û cemaal  
ya çira ewliya  
ya îmam el enbiya  
ya şefî'ê ummet  
dixwazim şefa'et  
bi arê eşqa hebîb  
ji wî re tu yî tebîb  
esslat û selam  
ser te û alê kîram  
Mihemed Mistefa selewat

\*\*\*

الفضل والكمال . 1

Wer guhlên ixwan mino bi wefa  
ez hewaldim mewlîdê bike sefa  
Bi eşqa dilê xwe bike tar û mar  
ji te re namîne va rozîgar  
'eceba çona çû ket rehîma dêkê  
muxteser ev aciza beyan bikê  
Ebdella dibîne xewneka muqedder  
zincîrek kêşa ji piştta wî hate der  
Heya 'erşa radibe ew serteser  
diçe ba te'bîrcî xwen da xeber  
Got ji piştta te mirovek êkê were  
bi pêxember be heyra erşê here  
Paşê bi rê ket û hat mal şaduman  
li rê rast xatûnekê hat heman  
Fatme qîza Murre bû ew nîgar  
çavê xwe li nûra wî ket namdar(navdar)  
Wê çaxê aşiq wê nûrê bû heman  
ji eşqa wî re aqil vê re nema  
Çawa ewê aşiq wî nebe ey ciwan  
li eniya wî dît nûra fexrê cîhan  
Ji wî êkê were nûr û kibriya  
şewqê da cîhanê pevde bû diya  
Vê re got min bixwaze ey emîn  
ezê sed hêştirî bidim te hemîn  
Bi va qewlê tu kê min îro bibî  
xêrji îro tu rojek din qebûl nabî

Bi remlê zanî xatûnê wê şevê  
ew nûr êkê di rehîma kê keve  
Seba wê got tu kê min îro bibî  
taku ew nûra bi nesîbê wê bî  
Got eger zîna ye miradê te du'a  
serê min here dîsa nabe rewa  
Na eger tu dixwazî emrê xwedê  
heya ez diçime mal mihlet bidê  
Wê demê hat mal hewalda ew şora  
danişî bi kulfet û mêrê xwe re  
Vê re gotin layiqe tu wî bibî  
madema ew aşiqê nûrê dibî  
Bala xwe pê de li teqdîra xwedê  
ew kê wê nûra minewwer bide kê  
Wê rojê heya êvarê ma li mal  
nûr kê here eniya Emîna delal  
Wê şevê hat ba Emînê da selam  
Emînê rabû jê re kir xweş qiyam  
Wê çaxê ketin sefa û 'işretê  
bi hev re dikine xweş miñbetê  
Wê gavê daket nûra şahê Êherem  
ew sedefa ket rehîma muhîterem  
Ew nûra çû eniya Emînê heman  
demekê di rehîma wê de ew dima  
Wê rojê ji xew rabû bavê emîn  
wî dixwast here wê xatûnê bibîn

Çû ser sozê xwe vê re got Fatîme  
ez seba sozê min û te hatime  
Fatmê sekir li eniyê da cewab  
got kanî nûra te ey bilind cenab  
Ne tu yî ewê min soz vê re kirî  
ew şor kir û wê heman pir dagirî  
Got nûrek pak hebû di eniya te de  
li rêka wê nûrê serê min fîda  
Ew nûra çûye kanî te çi kirî  
te ew biriye di kû de winda kirî  
Ez aşiq ew nûra pak bibûm ciwan  
te ew bir li kûderê çekir nîhan  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin esselet û selem

\* \* \*

Çaxa ket rehîma Emînê Mistefa  
vê cîhanê kir hezar zewq û sefa  
Çiqas firîşte hene giş sef bi sef  
bi edeb tîn Emînê dîkin tewaf  
Dema bi Mistefa ew bû hamîle  
ew xudan exlaqa rind û kamîle  
Emînê got pir 'ecayib tişt me dît  
emma ji hemla xwe min zeîmet ne dît  
Miha pêşî hat Adem got Emînê  
Bibe bi hemla xwe Mihemed mizgînê

Meha din hat Şîs anî mizgîn bira  
    esselam got merheba ji hemla te ra  
Meha sisiyê hat Idrîs da selam  
    Got ji te re mizgîna fexrûll enam  
Meha çarê hat Nûh wî got heman  
    Mizgînê kanî dêka fexrê cîhan  
Meha pêncê hat Hûd bilind sîfat  
    Mujde dabû hemla fexrê kaînat  
Meha şeşê hat Îbrahîm Xelîl  
    Got kanî mizgîn bi hemla te û cemîl  
Meha heftê hat Îsmâîl hemîn  
    Mujde dabû rehmeten lîl'alemîn  
Meha heştê hat Mûse ba wefa  
    Mizgînê kanî Emîne bi Mistefa  
Meha nehê hat Îsa ji esûmên  
    Min ji te divê hemla fexril murselîn  
Berî were hate dîtin pir mu'cîzat  
    Bi eşqê bi şewqê bibêjin selewat





## Mizgîn ji Emîne re

Mizgîn ji te re Emîne  
Ew şefî'ill muznîbîn e  
Te hilgirt ew li Receb  
Ew e kaniya edeb  
Meha diduyê Şe'ban e  
Qedra wî ya pak Xwedê zane  
Meha sisîyê Remedan e  
Mefxerê Benî Ednan e  
Şewal bû meha çarê  
Ron bû cîhan bi nûrê  
Zul hîce hat bi sefa  
Te bi hêmle xwe nedî cefa  
Muhrremê da te xeber  
Nûr da cîhanê seranser  
Paşê li meha Seferê  
Ew serwer wê were  
Çaxa Rebî'il Ewwel hat  
Ew bû fexrê mewcûdat  
Hat ew bû şahê kewnên  
Dî bi çavan qabe qewsên  
Bû xudanê zemzem û tacê

ka mizgîna Ehmed wîne  
mizgîn ji te re Emîne  
va cana fîdayê we be  
mizgîn ji te re Emîne  
bi hêmle fexrê cîhan e  
mizgîn ji te re Emîne  
efdelê kewn û mekan e  
mizgîn ji te re Emîne  
can û serê min li dorê  
mizgîn ji te re Emîne  
da te mizgîna Mistefa  
mizgîn ji te re Emîne  
bi mewlûda xeyrûll beşer  
mizgîn ji te re Emîne  
dar û ber dide xeberê  
mizgîn ji te re Emîne  
te anî fexrê kaînat  
mizgîn ji te re Emîne  
şewqa wî da erd û ezmên  
mizgîn ji te re Emîne  
şeva îsrayê û mi'racê

Ji ummetê re bû racî  
Wê şevê ew gihîşt wîsalê  
Wey Xwedayê zul celalî  
Ew e şefî'ê ummetê  
Xudanê tac û dewletê  
Ew e xatimê enbiya  
Ew e hebîbê kibrya  
Ew e xudanê kewserê  
Gunehkaran li mehşerê  
Bavê Sma'il bêçar e  
Ji dergeha Xweda nare  
Hezar selewat û selam  
Ser al û eshabên kîram

mizgîn ji te re Emîne  
dît cemal û ba kemalê  
mizgîn ji te re Emîne  
siba li roja qiyametê  
mizgîn ji te re Emîne  
cîhan bi nûrê bû diya  
mizgîn ji te re Emîne  
ew e şefî' û rehberê  
mizgîn ji te re Emîne  
ze'îf û pir gunehkar e  
mizgîn ji te re Emîne  
li ser rûh xeyrûll enam  
mizgîn ji te re Emîne



## Mefxer mewcûdat Mihemed Mistefa selewat

Wer bixwîn ey bilbil şeyda hemîn  
hate çaxa me'şûqa tu nazenîn  
Gul vebûn çiçek vebûn hate buhar  
hate çaxa me'şûqa te gulîzar  
Wekî perwana bi arê eşqê tu  
şa bike dilşad bike ixwanê xwe  
Çawa bû cîhan bi nûra Mistefa  
kaînatê çona kir zewq û sefa  
Neh meh bû mideta hemlê tamam  
hate dema bûndina xeyrûl enam  
Danzde roj çûn ji Rebî'îl Ewel  
şeva danzda roj diçû ava belê  
Hate ber hatina wî bilind sîfat  
dayîka wî şahî dît pir mu'cîzat  
Wê şevê çi dît xeber da ey bira  
çendeka ez kê hewaldim ji te re  
Got ji hundur nûrek hate der heman  
bû ronî bi nûra wî pev de cîhan  
Doşeka sindusî danîn ji me ra  
ji zemînê heyânî ezmên ey bira  
Deriyên ezmên giştî vekirin  
bi ava rehîmê cîhan saçemîş kirin

Min dît sê al danîn ji ezmên  
    daketin ewna giş hatin serzemîn  
Yek ji wan danişti bû li rojavayê  
    yek çû li rojhilatê berqerar dibê  
Yek ji wan danişt li ser Ke'ba Xelîl  
    giş daniştin bi fermana celîl  
Paşê emir da xudanê zûl celal  
    ew kerîm û ew rehîm û vê heval  
Şande Cibrîl emîn hat wê demê  
    belav kir mizgîn li xelk û 'alemê  
Ridwanê bihuşt derî vekirin  
    deriyê dogehê mekin kirin  
Îûrî û gûlman pev de ketin zînet  
    xemilandin wana darê Bihuşt  
Emînê got min bala xwe da heman  
    ronahî bû xaniyê min nagihan  
Kes tunebû ez mabûm bi tenê  
    min dît çar dîlber hatin got Emînê  
Li dû wan Îhorî hatin ey humam  
    dane min wê çaxê selam  
Berî gişan hate ba min Asiye  
    di dûre hat Meryema 'Umraniye  
Paşê hat Îhewa û Sara jî dîsa  
    şên kirin mala me fexrul nîsaa  
Hevna şandin seke ey bilind humam  
    ew bikin giş xizmeta fexrûl enam

Bi me re gotin em hatin ey nîgar  
seba xizmetê bikin ey namdar  
Bîn da misk û 'enberê rîhan û gul  
here kê ew bîna xweş ey şahê dil  
Min ji van îşaretan zanî heman  
yê kê were dunyayê roja cîhan  
Hûr û xulman li xwe kirine zînet  
dane min mizgîna fexrê ummet  
Mizgîna wî dane ev dar û bera  
wehş û teyr û kevir û çiya li her dera  
Her yekî ji wan digot pir bi edeb  
vê şevê êkê bibe fexrûl Erebo  
Ji me re danîn doşeka sindisî  
Mistefa kê were gotin her kesî  
Bi nermî hatin ez mizdam wan hema  
min zanî hatina Taha pir nema  
Ji te'na re ez şewitîm wê si'et  
dane destê min qedeha şerbet  
Pir sipî bû weke şîr bû min sekir  
pir şêrîn bû ne wekî wê bû şekir  
Min vexwar ewa ketim ez ra hetê  
canê min derket ji rewşa ze hmetê  
min vekir wê çaxê çavê xwe heman  
hat teyrek kete cem min nagihan  
pişta min mizda wî teyrî ey humam  
hate der nûrek wek heyva tamam

di wê si'etê de bû xeyrûl enam  
rabe serxwe jê re bike îhtîram  
kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin eslat û selam

\*\*\*

Li cîhanê çi hebû kirin nîda  
bi hev re gotin hezaran merheba  
merheba ey canê canan merheba  
merheba dermanê derdan merheba  
Merheba gewre siltan merheba  
merheba ey kaniya 'irfanê merheba  
Merheba ey rohaniya cavê Xelîl  
merheba ey mehbûbê rebbil celîl  
Merheba şefî'ê 'asî ummet  
merheba xudanê tac û dewlet  
Merheba ey mirazê gişan tu  
merheba pêxemberê xwedayî tu  
Merheba ey rehmeten lîl'alemîn  
merheba tu yî şefî'il muznîbîn  
Merheba ey afîtaba leyezal  
merheba ey ma huna baqî zewal  
Merheba melcea 'asî ummet  
merheba ey fexrê cîhan merheba  
Merheba eşref xelk û cêhanê  
merheba xudanê Bûraq û Zemzemê

Merheba ey efdelê kewn û mekan  
merheba ey sirûrê xelkê cîhan  
Merheba tu yî wesîla 'asiyan  
merheba tu yî pêxemberê rebil enam  
Merheba tu yî hebîbê zûl celal  
merheba me'şûqê aşiqê delal  
Merheba cemala te hêva zer be  
merheba qurbana te pêxemberî  
Merheba xudanê ava kewserê  
merheba heyrana çavê enwerê  
Bavê Smaîl hawara te dike  
siba tu kê li min şefa'etê bikî  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin esslat û selam  
Kî dixwaze ji êgir bibe necat  
bi eşq û şewq bêjin esslat

\*\*\*

Hate ew mehbûb rehman errehîm  
bi cemala xwe wî kir cîhan ne'îm  
Dane hev mizgîn firîşte û melek  
kete reqsê şa bû bi şewqê felek  
Pir 'ecayib dît dêka Ehmed dîsa  
Emîne xatûnê ew xeyrûl nîsa  
Wê demê got Emînê bi heybet  
hişê min çû pir ketim heyret

Min paşê sekir hêrî çûn kes nema  
     min Taha ne dît ketim fikrê hema  
 Li koşa kê ew çavê xwe bi min dê  
     rûyê xwe fitilandî ber mala xwedê  
 Bala xwe min da cemala wî heman  
     li secdê dike niyazî muste'an  
 Dilive liva xwe dike du'a  
     min nizanî çî digot xeyrûl wera  
 Paşê ez çûm nêzîkê min guhlêna  
     wê demê min du'eya wî hilîna  
 Banga xweda kir digot wî ya Ellah  
     ey kerîm û ey rehîm û padîşah  
 Ez şandim va dara mihnet  
     baxîşîn min ya Îlahî ummet  
 Taku siba li roja qiyametê  
     seba vana nekşînim ez zehmetê  
 Bang xweda fikir digot bi himmet  
     umeetê wa ummetê wa ummet  
 Carekê bala xwe bidin ehlî beser  
     bi însaf li vî tiştî bikin nezer  
 Çaxa bû pirsê li ummet bira  
     xêre tu nakî sunneta xeyrûl wera  
 Hîn î me'sûm bû digot wî ummet  
     tuyê kal bibî û dîsa bikî sunnet  
 Bi hürmeta wî hebîbî ey xweda  
     me li mehşerê ji wî meke cida



Seba xatirê enbiya û ewliya  
mexfîret ke me û muminan gişta  
Dayîk û bav û biryan ecme'în  
cîran û ixwanên me û muslîmîn  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin esselet û selam

\* \* \*

Bala xwe pê de çona bû ey hemam  
seba xatirê Mistefa bilind meqam  
Şeva ew zata bûye ey bi wefa  
kaînata pevda kir zewq û sefa  
Wê şevê ezman kete zînet  
seba xatirê wî şahê ummet  
Wê şevê lêket defa nibûwetê  
xelk û 'alem hate der ji zehmetê  
Wê şevê barî barana rehmetê  
cîhan derket wê çaxê ji zulmetê  
Wê şevê hat xudanê dewletê  
Ins û Cin wî anî der ji mihnetê  
Wê şevê ridwan û hûr bûn şadîman  
BiHuşta Firdos xemilandin heman  
Wê şevê pût û perest bûn sernegûn  
dînê xerab pev de xerabûn û çûn  
Wê şevê cîhan bû çawîr çîman  
dar û ber wê çaxê çîçek dan heman

Wê şevê deriyê Bihuştê vekirin  
     firîştâ Şeytan tev recim kirin  
 Wê şevê Ke'ba şerîf kir pir sefa  
     seba xatirê Mihemed Mistefa  
 Wê şevê xelk û 'alem qurbanê bûn  
     ins û cin pev de hema hêyranê bûn  
 Wê şevê nexwaşan dît gişan şîfa  
     seba wî şahî kesî nedî cefa  
 Wê şevê e'yanê Mekkê vê xîlaf  
     hati bûn Ke'be wana dikir tewaf  
 Secde kir Ke'bê wana dît xas û 'am  
     ne hezî kevirekî xwe kir xweş qiyam  
 Çi hebû wan gişan da hev selam  
     hîşev ji bo te xeyrûl enam  
 Ke'bê bang kir wê şevê got nagihan  
     vê şevê bû ji dayîkê roja cîhan  
 Ummeta wî wê werin ew sef û sef  
     xas û serqot wê bi min bikin tewaf  
 Ji pût û perestan wê min pak bikin  
     ji kifir û şirkê min xelas bikin  
 Ji erşê e'la sedaka<sup>1</sup> din jî hat  
     wê digot îşev bû fexrê kaînat  
 Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
     bi eşq bêjin esslet û selem

---

الصدى . 1

Ya Rebî ya rehman tu xudan îhsan  
    him xefûr û him xufran ya xaliq el ekwan  
Şukir hezar carî ji te re ey barî  
    tim subê û êvarê ya heq û ya deyyan  
Bi heqê pêxember bû ji min re sirûr  
    te şand ew rehber canê min bi qurban  
Li mehşerê xweda min ji wî meke cida  
    bin senceqa wî de heşir bike ya rehman  
Bû eşrefê gişan mefxer enbiya  
    bi roniyê bû ron zemîn û ezman  
Serwerê selatul lah Al Resûlullah  
    bû xêrê xelqillah hat jê re quraan  
Bang ke Bavê Sma'îl bi min bike naîl  
    ya reb ez im xafil ji derdê min ra derman



## Mefxer mewcûdat Mihemed Mistefa selewat

Ey birayê min hele vir de were  
bi rêka nefis û hewayê de mere  
Mu'cîzata wî şahî zani be tu  
masîwayê derxîne ji dilê xwe  
Xwedê çi mu'cîze da wî pakîzat  
ew xudan qedra mezin bilind sîfat  
Medîha wî kir seke rebil 'alemîm  
got tu li ser exlaqekî pir 'ezîm  
Fexrê cîhan çaxa gihîşt sala çelî  
nûra nibûwetê lê bû mincelî  
Bi ayet jê re quraan dahat  
aşîkare bû jê re pir mu'cîzat  
Sersiya xwe tune bû ey nazenîn  
nekete serzemînê resmê şahê emîn  
Govdê xwe pev de ji nûrê bû ji nûr  
sersî li nûrê nabe nake zihûr  
Li hafa serê wî her çax û zeman  
perçakî 'ewran lê dikir sayban  
Kû de teşrîf wî dikir diçû vê re  
li hafa fexrê cîhan ey bira  
Çaxa dilivî liva xwe şêrîn  
dîhezî hêv û roj li ezmên

Bi nûra diranê wek enco hemîn  
biketa derzî bi şev dihate dîn  
Bi porê herîr dibû gêncê hêja  
wekî misk û 'enberê xweş bîn dida  
Ger xûh bida jî dihat bîna gulê  
diherikî bîna xweş dera ku lê  
Bi roniya sîngê kîbar şeva reşê  
kal û can dere kû li pê dimeşê  
Çand xurmak li cihekî şahê cîhan  
gava çand vê re ketê meywe heman  
Keviran zikir kir bi fermana xwedê  
'alemê di pença wî şahî de dî  
Bû du perçe li ezmên hêva zerê  
bi îşareta wî heq pêxemberî  
Roj çû ava du'a kir Taha el emîn  
hate der şewqa rojê da serzemîn  
Di nava pença wî de herikî aveka sar  
herikî eşhaba avdaz kir vexwar  
Heywan û keviran jî deng kir vê re  
dar û ber bervê dihat wî bang kira  
Wî vekir çavê Qutade û Elî  
êşa xwe çê bû nûr bû muncelî  
Em giş qûlê wî ne ew şahê me ye  
di nîvê dil de ew hêva me ye  
Her du 'alem bi wî iftîxar dikin  
xelk û 'alem canê xwe fîda dikin

Paşî netê mu'cîza wî bi şora  
     ez nikanim hewaldim gişan bira  
 Çinkî vê hed û hesab in ey peder  
     min xeber da ji we re pir muxteser  
 Were hewaldan heya qiyamet  
     mu'cîzatên wî şahî paşî nehat  
 Ya Îlahî bi heqê Mihemed  
     bi hürmeta wî hebîbî ey xweda  
 Ya Îlahî bi hürmeta mewlîda  
     serwerê 'alem me jê meke cida  
 Ya Îlahî bi heqî tev enbiya  
     bi rehîma xwe mexfîret ke me gişan  
 Ya Îlahî bi heqê lewî û qelem  
     bi hürmeta xudanê tac û 'elem  
 Ya Îlahî bi heqê Taha El Emîn  
     me xelas bike ji Şeytanê le'în  
 Ya Îlahî bi heqê rûhê Resûl  
     bi fedla xwe lava me bike qebûl  
 Ya Îlahî bi heqê beytûl hêram  
     bi heqê pêxember bilind meqam  
 Ya Îlahî bi heqê giş aşiqan  
     bi heqê tev ewliya û sadîqan  
 Me gunehkaran tu me 'asî qûla  
     tu xelas ke ji qeda ji bela  
 Bibore gunehê me cema'et  
     bi lutfa xwe li me were merhemet

Pir qusûr û pir xeta ne û pir ze'îf  
     qusûra me gişan bibore ya letîf  
 Û dîsa yê mewlîd xwendin dide  
     lê were rehmê bi fedla xwe xweda  
 Sewaba vê mewlîdê tu ya Îlah  
     baxîşîn rûhê hebîbê kibriya  
 Baxîşîn Erwa'hên giştî enbiya  
     baxîşîn erwa'hê eşaban gişa  
 Bi hürmeta wî hebîb ey xweda  
     xaseten ev mewlîda xwendin daye  
 Riswa meke me ze'îfa ya Îlah  
     me li mehşerê ji wî meke cuda  
 Ey xuda ji te re pir hemd û sena  
     ey kerîm û ey rehîm û padîşah  
 Tu qusûra me ze'îfan bibaxşîne  
     rehma te vê paşî ye ya rebbena  
 Ez rica dikim min 'aciz kêmîrî  
     dilê me ji masîwayî pak bikî  
 Bavê Smaîl feqîr e pir xeta  
     bike ji ummeta pêxemberî  
 Selewat li rûhê xeyrûl enam  
     bibore li min tu xudan fedl û 'eta  
 Ew li ser pêxemberan û enbiya  
     ew li ser eşab û alî wî gişan  
 Sed hezaran şukir û minnet li xîtam  
     ji xwedê re vê hesab dayîm mudam

Ey birayê min eger tu salîh e  
bixwîne ji rûhê min re Fatîhe  
Kî dixwaze ji xwedê bilind meqam  
bi eşq bêjin eslat û salam

\* \* \*

Helandim ez wan çavên te	şewitandim van navê te
Canim qurban bejna te	şefa'et ya resûlellah
Çi xweş e navê te şêrîn	hebîbê mino nazenîn
Gunehkar im û pir miskîn	şefa'et ya resûlellah
Cemala te ya nûranî	bûyê mehbûbê vî canî
Va pir qusûr û nuqsanî	şefa'et ya resûlellah
Xwedê zane bi sewdayê	ez bûm mecnûnê
leylayê	
Li derdê min bike dewayê	şefa'et ya resûlellah
Şan û qudreta siltanê	"elem neşreñ leke <sup>1</sup> " zanê
Yasîn û taha kir qesem	bi navê te û muhterem
Meded siltanê bi kerem	şefa'et ya resûlellah
Tu yî mefxerê enbiya	tu yî serwerê giya
Tu yî penaha 'asêya	şefa'et ya resûlellah
Tu yî ew siltanê kewnên	tu yî bavê Hesen û Husên
Tu yî îmamê heremên	şefa'et ya resûlellah

---

الم نشرح لك .<sup>1</sup>



Hawar dikim hezar carî  
Xelas ke min gunhkarî

Hezkiriyê çar yar im ez  
Xizan û şermezar im ez

Bavê Sma'îl selatê tu wîne  
Li ser eshâba şev û roj

siba li dergeha barî  
şefa'et ya resûlellah

dîlê xandan im ez  
şefa'et ya resûlellah

li ser şeffî'ê xwe  
şefa'et ya resûlellah



**Esslat û wsselam**  
**li ser te ezbenî ya Resûlullah**

Esslat û selem li ser te

ya hebîbê me û hebîbê xwedê

Esslat û selem li ser te


ezbenî ya nûra erşa xwedê

Esslat û selem li ser te

ezbenî ya destpêka xelqê xwedê û xitma pêxemberên xwedê

Esslat û selem li ser te

ya serwerê ewwelîn û axîrîn



## Telqîna Miriyan

Bi tevahî, li gor bawerî û adetên mislimanan, gava ku mirov dimre, tê şuştin, kefenkirin, binaxkirin û paşê tê telqînkirin. Telqîn jî piştî veşartinê li ser gorê ji hêla xoce yan şêxekî olî ve tê xwendin.

Telqîn bi xwe lave, gotin û zînine olî ne, li her deverekê û li gor her rêolekê (mezheb), pihindik, ji hev cuda dibin. Lê belê ew bi tevahî di çarçewa zanîna olî ya derbasbûna miriyan bo cîhana din de digere. Mebest jê ew e, ku kesê mirî bersiva pirsên herdu firîşteyên hesabê gorê (Enker û Nekîr) bi şêweyekî rast bide, û ol û baweriyên xwe yê mislimantiyê yê jiyana xwe ya dinyayê diyar bike.

Telqîn ne ferza û ne jî sinet e, ew di dema pêxember de tine bû. Loma jî deqeke yeksane û hevgirtî ji telqînê re nîne. Lê belê bi tevahî, xwendina wê bûye adeteke cihgirtî, naverok û mebest wê jî li hemî deveran pir nêzîk hev dibin. Ê li navça me -Efrîn- bi piranî ev herdu deqên jêrîn li ser gora mirî tên gotin, telqînek ji mezinan re heye, yek jî nemaze ji miriyê zarok re ye.

Me ev herdu deq ji pirtûkeke kevin wergirtin û wergerandin Kurmancî. Hêviya me ew e, ku xoceyên me telqîna miriyên me bi Kurmancî bikin. Çima na!? Madam Tirk, Ereb û Ecem erkên xwe yê olî bi zimanên xwe dikin, ma çima emê jî wan erkan, û di nav de rêwresmên Telqînê, bi zimanê xwe nebêjin!? Nemaze jî, ew ji hêla millet ve û ji aliyê olî ve jî tê qebûlkirin, û bêguman wê cihê razîbûn û spasîyê be jî.

**Dr.Mihemed Ebdo Elî**

## Telqîna Mirîyan

### **Bi Navê Xwedayê Mihirbanê Dilovan**

Ji Xwedayê gewre pêve tu Xwedê tunene, hezretî Mihemed pêxemberê Xwedê ye. Xweda yek e, bi tenê û bê heval e, arzî ya wî ye, malavabûn ji wî re ye, ew zindî dike û dimrîne, çêxwazî di destê wî de ye û li ser hertiştêkî serdar e.

Xwedayê gewre di Qurana xwe ya pîroz de gotiye: ((Her nefsek wê mirinê bibîne, winê berdêla karê xwe jî li roja qiyametê bibînin, kî ji êgir hat dûrxistin û derbas bihuştê bû, serkeftî dibe. Xwaşiya jiyana vê cîhanê tenê ya nefsgirtinê ye. Yê li ba we xelas dibe, lê yê li ba Xwedê dimîne. Ji bilî heyîna Xwedê her tiştêk fanî ye, destlat a wî ye û winê li wî jî vezerin. Hertişt li ser zemînê wêran dibe, tenê Xwedayê te yê gewre û bi rûmet dimîne. Tuyê bimirî, ew jî wê bimirin, winê li roja qiyametê li ba Xwedayê xwe bibin dozdarên hev)).

Ey evdalê/evdala Xwedê

## **تلقين متوفي**

**بسم الله الرحمن الرحيم**

لا إله إلا الله محمد رسول الله، لا إله إلا الله وحده لا شريك له، له الملك وله الحمد يحيي ويميت، بيده الخير وهو على كل شيء قدير.

قال تعالى: ((كل نفس ذائقة الموت، وإنما توفون أجوركم يوم القيامة، فمن زحزح عن النار وأدخل الجنة فقد فاز، وما الحياة الدنيا إلا متاع الغرور. ما عندكم ينفد وما عند الله باق. كل شيء هالك إلا وجهه، له الحكم وإليه ترجعون. كل من عليها فان ويبقى وجه ربك ذو الجلال والإكرام. إنك ميت وإنهم ميتون، ثم إنكم يوم القيامة عند ربكم تختصمون)).

يا عبدالله ابن أمة الله، اذكر العهد الذي خرجت عليه من دار الدنيا إلى دار الآخرة، وهو شهادة:

أن لا إله إلا الله وأن محمدا رسول الله، وأن

kurê/keça evdala Xwedê, ew soz û peymanana ku tu li ser wê ji cîhanê derketî û pê diçî warê axretê bibîr wîne û bi zimanekî zelal bêje: Ji bilî Xwedê tu Xwedê tunene û hezretî Mihemed pêxemberê Xwedê ye, bihuşt, agir, mirin û gor rast in, Munker û Nekîr rastî ne, pirs û bersiv, hesab û mîzan, gunevedan û lêborîn, hêwzoyê kewserê û pira siratê jî rastî ne, hêşira mirov û dîtina bawermendan ji Xweda re di bihuştê de rast in, hatina qiyametê û vejandina kesên di goran de rastîne bêguman in. Tu bi Xwedê wek yek Xwedê bawer dikî, bi ola Îslamê û bi hezretî Mihemed jî, nimêj û silava Xweda lê be, wek şande û pêxember, razî bûyî.

Ev warê yekê ye ji warên axretê, û warê dawî ye ji warên cîhana fanî. Xwedê di pirtûka xwe ya hêja û pîroz de gotîye: ((Me win ji axê afirandin, emê we lê vegeştînin û careke din ji bo vejînê û hesêb jê derînin)).

Ey evdalê/evdala Xwedê,

الجنة حق، وأن النار حق، وأن الموت حق، وأن القبر حق، وأن منكرًا ونكيرًا حق، وأن السؤال حق، وأن الجواب حق، وأن الحساب حق، وأن الميزان حق، وأن القصاص حق، وأن الحوض حق، وأن الشفاعة حق، وأن الصراط حق، وأن الحشر حق، وأن رؤية الله تعالى في الجنة للمؤمنين حق، وأن الساعة آتية لا ريب فيها، وأن الله يبعث من في القبور، وأنك رضيت بالله ربا واحدا، وبالإسلام دينًا، وبمحمد صلى الله عليه وسلم رسولًا ونبيًا.

هذا أول منزل من منازل الآخرة وأخر منزل من منازل الدنيا الفانية. كما قال الله تعالى في محكم كتابه العزيز الحكيم:

((منها خلقناكم، وفيها نعيدكم، ومنها نخرجكم تارة أخرى)).

الآن يأتيك الملكان الكريمان الموكلان المحاسبان، فلا يفزعاك، ولا يروعاك، ولا يهولاك،

niha du firîşteyên hesêb ên pîroz wê werin ba te, ji wan metirse, bêzar mebe, ew afrande ne ji afrandeyên Xwedê, eger ji te pirsîn û gotin: Xwedayê te kî ye? Pêxemberê te kî ye? ol, îmam, qulbe û birayên te kî ne?

Bê tirs bêje: Xwedayê gewre Xwedayê min e, hezretî Mihemed pêxemberê min e, Îslam ola min e, Quran îmama min e, Ke'be qulba min e, bawermend û misliman hemî birayên min in, ez li ser wê afirîme, li ser wê jîya me û li ser wê jî mirime, bi ya Xwedayê gewre tuyê li ser wan jî werî vejandin û dilrihet bibî.

Xweda te li ser gotina rast rawestîne, ((Xweda mirovê bawermend li jiyânê û axretê li ser gotina rast radiwestîne, setemkaran rêwindayî dike û çî bixawze wî dike)). Ey nefsa dilrihet, bi dilekî razî li Xwedêyê xwe vegere û derbas be nava perestvan û bihuşta min a bilind û rengîn.

فإنهما خلق من خلق الله تعالى، فإذا سألاك: من ربك، ومن نبيك، وما إمامك، وما دينك، وما قبلك، وما إخوانك؟

فقل: الله ربي، ومحمد نبي، والقرآن إمامي، والكعبة قبلتي، والإسلام ديني، والمؤمنون والمسلمون كلهم إخواني، على ذلك خلقت، وعلى ذلك حبيبت، وعلى ذلك مت، وعلى ذلك تبعث إن شاء الله تعالى وأنت من الأمنين.

ثبتك الله بالقول الثابت ، ((يثبت الله الذين آمنوا بالقول الثابت في الحياة الدنيا وفي الآخرة ويضلل الله الظالمين ويفعل الله ما يشاء)). يا أيتها النفس المطمئنة، ارجعي إلى ربك راضية مرضية فادخلي في عبادي وادخلي جنتي.

## Telqîna Zarokan

### Bi Navê Xudayê Mihirbanê Dilovan

Ji Xwedê pêve tu Xwedê tunene, hezretî Mihemed jî pêxemberê Xwedê ye. Ew bi tenê û bê heval e, arzû ya wî ye, malavabûn ji wî re ye, zindî dike û dimrîne, jîndar e û li ser hertiştêkî jî serdar e.

Xwedêwo, ev zarokê ku hîn hişdar nebûye, pênuşan li ser ne kirine, şaşî û guneh wernegirtine, te bi dilovaniya xwe afirand û bi vîna xwe mirand, ew jî ji perestvanên te yên çêxaz e, Xwedawo tu wî ji dê û bavên wî re bikî pêşber, saman, lêbordar û lêborxwaz, û bi wî qezenca wan giran bikî, dereca wan bilind bikî û tebatê bi ser dilên wan de berdî. Xwedawo ta dê û bavên wî dikevin bihuştê û dilxwaziyên xwe, tu wî li ber deriyê bihuştaxwa bikî bendewar.

Gelî amadeyan, dilovaniya

## تلقين طفل متوفي

### بسم الله الرحمن الرحيم

لا إله إلا الله محمد رسول الله. لا إله إلا الله وحده لا شريك له، له الملك، وله الحمد، يحيي ويميت، وهو حي وهو على كل شيء قدير.

اللهم وهذا الطفل الذي لم يبلغ الأحلام، ولم تجر عليه الأقلام، ولم يكتسب الخطايا والآثام، خلقتة برحمتك وتوفيتة بإرادتك، وهو من عبادك الصالحين، اللهم اجعله قرطاً لأبويه وسلفاً، وذخراً، واعتباراً، ومشجعاً لهما، وثقل اللهم أجرهما، وارفع به درجاتهما، وأفرغ الصبر على قلوبهم. اللهم اجعله مهبطاً إلى باب جنتك حتى يدخلها أبواه فيها وينال ما يتمنياه.

يا معشر الحاضرين رحمكم الله، جعل الله حطامنا وحطامكم في

<p>Xwedê li we be, Xwedê termê me û we bigihîn cihê herî bilind, sewaba seabirdaran bike para me, û Xwedê li gunehên me û we tevan bibore.</p> <p>Xwedêwo tu li miriyên bawermend û mislimanan biborî. Xwedêwo tu gorên wan ron, fere, rûgeş, bişahî û dilşa bikî û li xelkê goristanan biborî. Tu xudan î, tu Xwedê yî, lêbordarî, dilovanî, bawermend di bihuştê de herdem navê te yê gewre hildidin, silava wan jî "selam" e, lava wan a dawîn jî: Pesin û spasî ji Xwedayê cîhanê re.</p>	<p>أعلى عليين، وأثابنا وأياكم ثواب الصابرين، وغفر الله لنا ولكم أجمعين.</p> <p>اللهم اغفر لأهل القبور من المؤمنين والمؤمنات، والمسلمين والمسلمات أجمعين، وأجعل اللهم في قبورهم الضياء والنور، والفسحة والسرور، والبهجة والمغفرة على أهل القبور. إنك ملك رب غفور رحيم، دعواهم فيها سبحانه اللهم وتحيتهم فيها سلام وآخر دعواهم أن الحمد لله رب العالمين.</p>
---	--

<p><b>Lava piştî telqînê</b></p> <p>Xwedawo.. Xoşhevalê bêkesawo, tu her heyî, herdem li ba me yî. Xwedawo tu tenêbûna me û wî hêsan bikî, li xerîbiya me û wî dilovan bî, gotina rast jê re bêjî, me jî ji riya rast dernexî, li kêmaniyên</p>	<p><b>دعاء بعد التلقين</b></p> <p>اللهم يا أنيس كل وحيد، ويا حاضرا ليس يغيب، انس وحدتنا ووحده، وارحم غربتنا وغربته، ولقنه حجته، ولا تفتنا بعده، واغفر لنا</p>
---	---



me û wî biborî ya Xwedayê gerdûnê.

Xwedawo.. Eger ew çêkar bû, çêkariyên wî pir bike, û eger gunehkar bû li gunehên wî bibore.

Xwedawo.. Li wî dilovan be, wî biparêzî, lê biborî, warê wî di bihuştê de bilind bikî, dergeh û gora wî fere bikî, bi avê, berfê û zîpikan bişoyî, wekî çawa kirasê sipî ji qirêjê pak dibe tu wî ji gunehan pak bikî, maleka ji mala wî çêtir, xudanine ji xudiyên wî çêtir bidê, wî derbas bihuştê bikî û ji eşa gorê û eşa êgir biparêzî.

Selwata Xwedê li seydayê me Mihemed û mal û hemû dostên wî be.

Ji bo hezretî pêxemberê Mistefa, malbata wî, dostên wî, giyanê miriyên me û miriyên bawermendan, bi taybetî jî ji bo giyanê miriyê me yê dilovanî El-Faaatîhe...

وله يارب العالمين.

اللهم إن كان محسنا فزد في حسناته، وإن كان مسيئا فتجاوز عن سيئاته.

اللهم ارحمه وعافه واعف عنه، وأكرم نزله ووسع مدخله، واغسله بالماء والثلج والبرد، ونقه من الخطايا كما ينقى الثوب الأبيض من الدنس، وأبدله دارا خيرا من داره، وأهلا خيرا من أهله، وأدخله الجنة، وأعدّه من عذاب القبر ومن عذاب النار.

وصلى الله على سيدنا محمد وعلى آله وأصحابه أجمعين.

إلى حضرة النبي المصطفى وآله وأصحابه وإلى أرواح أمواتنا وأموات المؤمنين وخاصة روح المرحوم الفاتحة.

=====

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z- 2636.K  
de, hate weşandin**

[www.yek-dem.net](http://www.yek-dem.net)

[info@yek-dem.net](mailto:info@yek-dem.net)

دہ

کتابا مولدی شریف بزمانی کرمانجی و ظریف

آرا

منلابی زویی گرا

شیخ علی عمر منلا علی



حقى طبعى ژى مؤلف را محفوظه

۱۳۶۷

بلبل ۱۳۶۷ سالی هجرتی

قیمتا حر نسخه کی ۱۵۰ قروش سوروی به

مطبعة اراکس : حلب (سوریا) شارع التل